Rastî bi ser dikeve lê…

Ehmedê Cezîrê

Mirovekî ji xwe re digot: Dibêjin rastî tim bi ser dikeve. Ka , ezê binêrim , ev gotin ta bi çi radeyê wilo ye ?

Rojekê di ber melekî re derbas dibe, dît ku, mirovek yekî din bi xençerê dikuje, davêje nav daran û bazdide. Lê tu kes ji bilî wî , wê bûyerê nabîne.

Ji xwe re got: Bi xwedê, ji min re, lêhat . Ew çû navenda polîsan û ew agahdar kirin ku, mirovekî kuştî, li ber çem, di nav daran de ye, û wî ew kuştiye.

Lêkolîner jê bawer nekir, hinekî bi ser xwe de mijûl bû, lê nihêrî û jêre got: Kuro li te xuya nake ku, tu kuştiyarî.

De ka, ji me re sedema kuştina te jê re bibêje. Wî ji wan re got: Perên min lêbûn, min jê xwest, wî neda min, qirecir di nav me de çêbû, wêlomê min xençerek lê da û kuşt.

Yê lêkolîner, gote leşkerekî, wî bavêjin zîndanê. Piştî hefteyek, dîsa ew da ber pirsan û jêre got: Me pir pirsa rewşa te kir, ne xuya ye ku, tu tewanbarî !.

De ka rastiyê ji me re bibêje. Wî got: Ma hûn ji min çêtir zanin heyran?

Lêkolîner lê vegerand û got: Bawerî bi me re çênebûye ku, te ew kuştiye.

Careke din ta hefteyekê, ew avêtin zîndanê. Piştî heftak derbas bû, ew anîn dadgehê û li pêşiya dadger sekinî .

Dadger jêre got:

Te ew mirov kuştiye ?

Erê min kuştiye .

Çima te kuşt ?

Ji bo nadandina perên min .

Dadger: Emê te bi darvekin, ka gotina te ya dawî çiye ?

Gotina min ya dawî ew e ku, min ew kuştiye û biryar ji xwe, ya we ye. Piştî Înekê, ew anîn kastînê, xelk lê civiya .

Dadger gote xelkê Temeşevan, vî mirovî kuştin kiriye, wêlomê emê wî bidarvekin . Em ji bîr nekin ku, yê kuştiyar bi xwe jî di nav temaşevanan de ye.

Dadger fermana bi darvekirinê da . Ziman ji devê wî derket. Lê, ji nişka ve, kuştiyarê rasteqîn got: Rawestin, werîs ji qirka wî derxin .

Bi xwedê hîn ez zaro bûm, wî bavê min kuşt, wêlomê min tola xwe jê hilanî. Lê, pirsa min ew e çima vî mirovî ev kuştin kire stuyê xwe.

Piştî av li rûyê wî mirovî kirin û bi xwe hesiya, ew pirs jê kirin .

Ewî got: Min xwest ez binêrim ka xwedê rastiyê bi ser dixe yan na ! .

Jê pirsîn : Te çawa dît ? .

Got : Rastî bi ser dikeve, lê, ta ku, zimanê mirov bi du bostan der dikeve .